
# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

## NEWROZ 83 LI SWÊD




9/83

www.arsivakurdi.org

ADAR/1983

# BERBANG

HEJMAR 9 / SAL 2

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD

NAVEROK


Newroz 83 ........................ 3
Axaftına şeva Newrozê....... 5
Wutari ahengi Newroz......... 7
Mesajên parti û rêxıstınên Kurd.................... 9
Mesajên Rêxıstınên dın.................... 14
Tekilıya zaravayên Kurdi.. 15
Tiyatroya Kurdi................ 18
Çend helbestên Sorani...... 20
Namên Xwendevanan....... 21
Mendalê Mamoste........... 22
Xaçerêz ............................ 23



Berpırsıyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistına Nıvisaran
SEYRAN û GULBAHAR

Redaksiyon
KEYXUSRO SİPAN-MAHMÛD
LEWENDİ-BENGİN BOTANİ
ŞORIŞGÊR ESKERİ-ROZA SEYRAN

B E R B A N G

*Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Rıza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.*



ADRESS

*Kurdiska Riksförbundet,*
*Tunnelgatan. 14, 3 tr.*
*111 37 Stockholm/SWEDEN*
*TEL : 08/ 11 23 42*



*Prenumeration: Medlemmar 50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.*

*Postgıro: 64 38 80—8*


Xwendevanên Hêja

Komelên Kurdıstani yên ku dı dın baskên FEDERASYONÊ de yek bûne, Newroza isal ji-wek sala buhuri-dı bın serokatıya Federasyonê de, bı hevûdu re piroz kırın. İsal ji dı şeva Newrozê de dı ser hezari re Kurd beşdar bûn.

Dı têkoşina gelê me de, iro mesela heri gıring yekiti ye. Ev rasti, jı alıyê hemû welatparêzên Kurdistanê ve û dı her fırsendi de têt diyar kırın. Em gış êdi têgıhiştıne ku bê yekitıyeki netewi, (çı dı planê rêxıstıni û sıyasi de dıbe û çı ji lı ser bıngehê bir û baweri dıbe) welatê me rızgar nabe û Kurdıstana me ya yekbûyi û serxwebûyi nayê damezrandın.

Yekbûna dı roja Newrozê de an dı rojên wek wê de, yekbûna lı dervey welat, yekbûna dı planê komelan de, yekbûna dı têkoşinê de û dı xebatên rojane de, lı yekitıya hêzên rızgarıya netewi rê vedıke û wê hêsantır û nêztır dıke

—Bıji yekitıya rızgarixwazên Kurdıstanê, lı her deri, her gav û dı her plani de!..

BERBANG

*TÊBINİ: Dı hejmara 8'an, rûpel 7 de dı şûna "KOMELA KARKERÊN KURDISTAN LI SWÊD" de "Komela Karkerên Kurdıstan lı Uppsala" hatıye nıvisandın. Bıla xwendevan çewtıya me bıbexşinın.*
*BERBANG*


*B E R B A N G*

*Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyona Komelên Kurdistanê lı Swêd. Buha : 5 Kron, Abona salekê: 50 Kron, 30 DM.*

*N A V N İ Ş A N*

*Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.*
*111 37 Stockholm/ Sweden.*
*Tel : 08 / 11 23 42*
*Postgiro : 64 38 80—8*


www.arsivakurdi.org

## BI HÊVIYA NEWROZÊN AZAD LI KURDİSTANEKE SERBIXWE



### DI BIN ALA FEDERASYONÊ DE

# Me Newroza İsal Bı Hevûdu Re Piroz Kır

FEDERASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD, DI ROJA 19' Ê ADARÊ DE, EV CARA DUWEM BÛ KU BI AWAKİ KİTLEWİ Û BI RUHIYETEKE KURDİSTANİ VE NEWROZÊ PİROZ KIR.

DI ŞEVÊ DE DI SER HEZARİ RE KES HEBÛN, JI BER TENGBÛNA Cİ HINEK HEVAL LI DERVE MAN. Û EV DİSA CARA DUWEM BÛ KU LI SWÊDÊ HEWQAS KURD GIHİŞTIBÛN HEV, HIM Jİ JI HER ÇAR PARÇEYÊN KURDİSTANÊ,. BI RASTİ EV TIŞTEKİ GELEK GIRİNG Û HÊJA BÛ. LÊ DIVÊ EV TENÊ DI WARÊ ŞEV AN HIN PİROZKIRINAN DE NEMİNE, DIVÊ EV FIRETIR Û PÊŞDETIR BIBE.

Bêyi kurdan, gelek mêvanên bıyani û swêdi ji dı şevê de beşdar bıbûn. Gelek mesajên pirozbahiyê ji hatıbûn şandın. Parti, Rêxıstın, Komele û kesên ku mesaj şandıbûn ev ın :

1- Partıya Dimoqratên Kurdên Pêşverû lı Suriyê – Leqê Ewrupa -
2- PPKK – Partiya pêşeng a Karkeri Kurdistan
3- Kemal Burkay – Sekreterê Gıştì Partiya Sosyalist a Kurdistana Tırkiyê
4- Komeley Rencdêrani Kurdistan — Rêkxrawi derewey welat
5- Rêxıstına Partiya Gel a Demokrati a Kurdistan lı Swêd
6- Layengrani Hızbi Dimokrati Kurdistani Êran lı Swid
7- KUK Berpırsıyarê Swêd
8- Yekêti Nıştımani Kurdistan – Rêkxrawi Swêd
9- Komeley Şorışgêri Zahmetkêşani Kurdistani İran
10- Partiya Komunist a İraqê lı Swêd
11- TKP – B-Leqê Swed
12- Yekitiya Ked (Emeğin Birliği) - Leqê Swêd
13- İSTİB - Yekitiya pêşverûyên Jı Tırkiyê lı Swêd
14- KOMKAR (Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan lı Elmanya Federa l)
15- İrakiska Student Föreningen i Sverige
16- Cegerxwin

Programa şevê lı gel kêmaniyên xwe gelek dewlemend bû. Program bı paina gırami ya jibo şehidan vebû. Dı pê re jı Kurdistana Iraqê koroya muzikê çend marş xwendın û jı koroyê şûnde lı ser navê Komita Karger serokê Federasyonê axaftınek kır. Dı axaftına xwe de qala gıringiya Newrozê û rewşa Kurdistanê ya iro jn kır.

Dı pê axaftına endamê Komita Karger, jı Tenstayê gruba govenda zarokan çend listık amade kırın. Zarokên ku dı govendê de bûn emrê wan dı nava şeş û dehan de bûn. Jı govenda zarokan şûnde disa endameki Komita Karger bı sorani axaftınek kır. Wi ji bı kurtebırì dı axaftına xwe de qala gıringiya Newroz


Gurûba Govendgêrên Federasyonê

ê û têkoşina gelê kurd ya ku iro lı herçar perçên Kurdistanê têkırın kır.

Dı şevê de koroya muzikê ya Swêdiyan SÖDRA BERGENS BALALAJKA ji bı mêvandari beşdar bû. Hım jı ali deng û hım ji jı ali enstrumanan ve koroyek gelek dewlemend bû. Dı pê vê koroyê re lı ser navê VPK (Partiya Komunista Çep) yê yeki axaftınek kır. Wi ji dı axaftına xwe de qala problemên kurda kır.

Koroya zarokan jı Uppsalayê bı çend stranên xweşık beşdari şevê bûn. Dı pê wan re ji Komita Folklorê ya Federasyonê çend listık jı hêla Suriyê û Mêrdinê pêşkêşi mêvanan kırın. Jê şûnde xorteki bı sorani helbestek xwend.

Dı şevê de beşeki gıring ji pandomima ku jı ali kurdên Iraqê hat amade kırın bû. Dı pê pandomimê re gruba govendê ya Grêkiyan bı listıkên pontûsê beşdari şevê bûn û bı wan listıkên xwe yên xweşık şev geştır kırın. Dı pê govenda Grêkiyan re disa koroya muzikê ya kurdên Iraqê çend stran û marş amade kırın. Jı Tenstayê ji koroya zarokan çend stran pêşkêşi mêvanan kırın. Dı pê re lıgel muzikek modern gruba govenda kurdên Iraqê çend listıkên Kurdistana Iraqê pêşkêş kırın û dı pê re bı gruba xweya muzikê ji çend stran amade kırın.

Dı şevê de hevaleki bı tembûr û dengê xwe çend stranên geli pêşkêşi mêvanan kır.

Dı dûmahika şevê de mêvanan, hemiyan bı hev re, govend gırtın.

Me lı jorê gotıbû, lı gel kêmaniyên xwe şev gelek dewlemend bû, lê emê dı vê derê de hıneki lı ser kêmaniyên wê bıbêjın. Rast e, dı şevê de hın kêmani hebûn, lê ev ji baş tê zanin ku tu tıştek bê kemani nabe. Û gelo kêmaniyên ku dı şevê de berbı çav bûn jı kê bûn. Ango berpırsiyarên van kêmaniyan ki bûn ? Komita Karger ? , Komita çavdêr ? an Komita amadekırına Newrozê bû ? Dıbe ku kêmaniya wan hemiyan hebe, lê gelo ma tew kêmaniyên endaman ji tunebû ? Ku komelên ku endamên Federasyonê ne bı her awa yên xwe tevi şevê bana, şev dê hin xweştır derbas neba ? Dıvê em disa şûnda vegerın, jı nû ve dest pê bıkın ; Herweki dı Berbang hejmar yek de dı nıvisa "Bo çı Federasyon" de me qal kırıbû. Ya ku em pê dızanın Komita Newrozê beyan kırıbû ku her komelên endam dıvê bı hemi faaliyetên xwe tevi şevê bın.

Yanê gotına me Federasyon jı komelan pêk hatıye. Gava ku komelên endam faal bın, bıxebıtın wê gavê Federasyon ji faal dıbe. Lê gava ku xebatê komelên endam sıst be, bıvê nevê xebata Federasyonê ji sıst dıbe, jı ber vê yekê dıvê cara yekem komelên endam faalbın.


Orchestra Södra Bergens Balalajka

www.arsivakurd.org


# AXAFTINA ŞEVA NEWROZÊ

SEREKÊ FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ, SALİH İNCE Û BERPIRSIYARÊ CIVAKİ Û ÇANDİ, ŞORIŞGÊR ESKERİ, DI ŞEVA NEWROZÊ DE BI NAVÊ FEDERASYONÊ BI ZARAVAYÊN KURMANCİ Û SORANİ AXIFİN. EM VÊ AXAFTINÊ BI HER DÛ ZARAVAYAN Jİ PÊŞKÊŞİ XWENDEVANÊN BERBANGÊ DIKIN.

XUŞK Û BRAYÊN DELAL!

Disa Newroza me, roja şayi û azadiyê hat. Em disa jı bo pirozkırına Newrozê, bı hêviya rojên azad bı sedan, bı hezaran hatın cemhev.

Newroz rojeke şaiyê ye. Lê, lı ba gelê kurd cıheki taybeti dıgre, ku vi rojê jı xwe re kıriye roja berxwedan û serketınê.


*Salih İnce*

İro welatê me parvekıri û gelê me dı bın zordestiyeke dıjwar da dıji. Dıjmınên me, dıxwazın hebûna me, zıman û çanda me jı ortê rakın. Dıxwazın hêviya dılê me bışkênın, me sıst û qels bıxinın. Lê heta nuha dıjmın nıkarıbûye hêviya dılê me bışkêne û agırê azadiyê vemırine. Lı zindanan, lı çiyan, lı bajar û gundan ala tekoşinê bılınd dıbın. Newroza me tırsa dılê wane. Wextê ku Newroz nêzik dıbe, tırsa dılê wan zêdetır dıbe, weke dinên har, bı tırs, bı bêhêvimayin êrişê gelê me dıkın.

İro agırê azadiyê lı her derê Kurdistanê pêketiye. Lı Kurdistana İranê, pışti ketına Şahê xwinrıj, pêşmergeyên qehreman welatê me bı xurti dıparêzın û mafên xwe yên çarenûsi dıxwazın. Bı dehhezaran pêşmerge, bı bıryarê ku hetanê mırınê dest jı şerê xwe yê bıheq bernede. Tekoşina gelê kurd lı Kurdistana İranê bû hêviyeke xurt dı dılê gelê kurd da. Bıla Xumeyni ji zanıbe, ku bı kuştın û bı bombarandın dê nıkarıbe tekoşina gelê me bıde rawestan. Daxwaza gelê me daxwazeki bı heqe. Lê Xumeyni û hawirdora wi melayên paşverû, bı vi halê xwe, rabûne şerê gelê kurd gêdayiyê imperyalizmê ilan dıkın. İro, hın hêz û kes ji dıkarın lı ser vi şopa çewt bıbın pıştgırê wan. Lê roj bı roj daxwaza gelê kurd, şerê wi yê bıheq hê zelaltır têtê ditın. Yên ku xwe roj bı roj nêziki imperyalizmê dıkın, yên ku dan û stanên xwe bı dewletên paşverûyan ra xurt dıkın disa ewın. Bı navê din, daxwaza gelê me yên heri bıngehin inkar dıkın û gelqırkırınê pêk tinın. Lê dirok bımera ye, yên ku bı heqın, yên ku bı bir bawerın em ın. Û yên ku bıserkeve dê disa em ın.

Lı Kurdistana İraqê gelê kurd şerê xwe dıdomine. Pışti teslim bûna serokayetiya kevn ya paşverû, partizanên kurd, lı ser rêçeke nû şerê azadiyê geş kırın. İro bı deh hezaran pêşmerge, welatê xwe bı xurti dıparêze, Saddam sıst û qels ketiye. Dawiya wi ne dûre.

Rejima faşist ya Saddam, lı ber yekitiya hêzên pêşverû yê İraq û Kurdistanê roj bı roj dıhele. Muhalefet lı dıji Saddam, iro gelek xurte. Bê şık, yekitiyek hê xurtır dê gavên azadiyê bılezine. Kurdistan iro karargeha şerê şoreşgeri, ciyê sıtara şoreşgeran bûye. Saddam jı vi rewşê, dı nav buhranê da dıgevıze û jı bo vê yekê zor daye kuştın û surgûn kırınê. Bı sed hezaran kurd bı zor jı welatê xwe hate derxıstın. Pışti şerê İran û İraqê gelek kurd surgûnê İranê bû û nıha dı nav perişaniyê da ne.

Rewşa Kurdistana Tırkiyê, pışti İlona 1980 kete nav merhaleke nû. Generalên faşist bı hemû hêzên xwe qatliam û işkenceyên nediti pêk anin û vi ya dıdomının. İro ne tenê kesên aktif her ûsa gundiyên reben ji, jı bo ku kurdın, têne işkencekırın. Bê şık, işkence ne tıştеke nû ye jı bo gelê me, ev bı qasi bındest mayina me kevn ne. Harbûna faşistan, jı wê derê tê, ku gelê kurd dı nav hışyarbûneke fıreh de bû. Bı deh hezaran kes dı miting û tevgeran da jı kurdara azadi dıxwest, lı dıj faşistan berxwe dıda. Lı Tırkiyê tekoşina çina karkeran bılınd dıbû û bê huzûri dı nav her derê cı-

www.arsivakurd.org

vatê da fıreh dıbû û ber bı şoreşê va dıçû. Bê ku yekitiyeke xurt pêk bê, ev pêşveçûn hate şıkandın. Nıha lı Tırkiye û Kurdistanê bı sed hezaran kes dı gırtigehan da işkenceyên sistematik dıbinın. Bı sedan sosyalist, welatparêz dı bın işkence da hate kuştın û ev barbari hêji berdewam dıke. Wek xeberên ku belav dıbın, serleşkerên İranê yê Şah, ku reviyabûn, iro lı Tırkiyê û lı welatê me pısporiya xwe ya işkence kırınê lı ser gel pêk tinın. Hoyên zindanan gelek dıjware. Ew kesên ku dı zindan û işkencexanan da berxwe dıdın, em dexwazın gramên xwe diyar bıkın. Ew dızanın ku rojên pêşiyê yê gele. Nefreta gel lı dıj zordestan çıqas dıçe zêde dıbe. Jı bo serketınê dıvê hêzên welatparêzên Kurdistanê û dıj-faşistên Tırkiyê lı ser prensibên şoreşgeri bıghên hev, ku karıbın bıbın otorite û potansiyelê gel kanalize bıkın.

Lı Kurdistana Sûriyê, gelê kurd jı mafên xwe yên heri bıngehin bê par e. Nayêlın gelê me bı zımanê xwe bıxwine. Gelek kesên kurd hêji lı welatê xwe bênıfûsın. Bı pilan û bı metodên zor, gelê kurd jı welatê xwe tête derxıstın. Vana hemû bı navê pêşverûti çêdıbın.

Xuşk û brayên delal !

Roj rojên dıjwar ın. Newroz dı demeki wulo dıjwar da piroz dı. be. Dıjmın me daredor gırtiye, bı hemû hovitiyên xwe bı ser me da tê. Lê roj rojên xebatê ye. Bı bê hêvi nabe. Agırê şerê azadiyê ne tenê lı welatê me, her usa lı her derê dınyayê pêketiye. Hêzên şoreşger û dıj-şoreşger dı nav şereki gelek germ dane. Lı Rojhılata Navin gelê Fılistini jı bo welatê xwe şereki gelek dıjwar dıde. Amerika Yekbûyi bı destê siyoniyan qatliamê lı gelê Fılistin û yên dın pêk tine. Lı her derê dınyayê, emperyalizm, û beriyan hemûyan, emperyalizma Ameriki lı ser gelên azadi û pêşketixwaz qatliaman pêk tinın. Rejima El Salvador, bı alikariya Amerika, gelê El Salvadorê qır dıkın. Lı Guatemala, lı her derê Amerika Navin û Amerika Latin Amerika komplo û gelqırkırınê hazır dıke, lı dıj dewletên pêşverû erişan pêk tine, jı xura dewletên xulam avadıke. Cunta Tırkiyê, ya faşist bı alikari û daxwaza wan hat ser hukum. Jı bo talankırına welatên koloni, weke gurên har, rejimên faşist û paşverû tinın ser hukum.

Amerika, iro graniya xwe daye ser şereki atomi. Dıxwazın welatên sosyalist û Ewropayê bıkın meydana şerê atomi. Gelek çekên nû, dê lı Ewropa were bı ci kırın. Ger şereki atomi derkeve, dê hemû insaniyetê bı şereki atomi ya lokal bıde bawerkırın. Ma gelo şereki wulo lokal mumkune ?

Her ûsa Amerika û dewletên emperyalist, graniya xwe dane ser Tırkiyê û Kurdistanê dıkın meydana çekên xwe yên atomi lı dıj Sovyet. Balafırgehên ku lı Kurdistanê hatıne çêkırın tên nujen kırın. Ev felaketeke mezıne jı bo gelê kurd û jı gelên ciran re.

Xuşk û brayên delal !

Newroza me, rastê destpêka buharê tê. Dı vi demê da jiyanekê nû, jı tari û tofan, derbasi ronahiyê pêk tê. Şiyarbûneke, hêviyeke nû peyda dıbe. Sısti û qelsi ciyê xwe teslimê şiyarbûn û tevgerê dıke. Gelên bındest jı bo azadi û serxwebûnê bı xurti lı hember zordestan radıwestın. Dı dema Newrozê de, ne tenê gelê kurd, reşıkên bındest, gelên dın yê bın zılm û zordestiyê ser hıldıdın. 21 Adarê jı ali Koma Mılletan va roja dıj - nıjadperesti hatiye ilan kırın. Viya hê maneyek gewre dıde Newrozê û gelê kurd, ku mıl dı mıl da, bı gelên bındest re dıji emperyalizmê, kolonyalizmê û nıjadperestiyê, jı bo azadi û serxwebûnê şer dıke.

– Bımre emperyali, Kolonyali, nıjadperesti !
– Bıji yekitiya hêzên welatparêzan !
- Bıji Newroz !



Koroya Federasyonê ya Zarokan

# WUTARİ AHENGİ NEWROZ

SEROKİ FİDERASYONİ KOMELE KURDİSTANIYEKAN, SALİH İNCE W BERPIRSIYARİ KOMELAYETİ W KULTURİ ŞORIŞGÊR ESKARİ,LE AHENGİ NEWROZ DA, BE NAWİ FİDERASYONEWE, BE ZARAWAKANİ KIRMANCİ W SORANİ WUTARIYAN XWÊNDEWE. ÊMEŞ WUTARIYAN EXEYNE PÊŞ ÇAWİ XWÊNDEWARAN

Xuşk û Bırayani xoşewist !
Miwane Berêzkan !

Newrozi em salişman her wekû salani rabırdû be sedan kes le yek nêzik kewtûynetewe, bo gêrani ahengeki neteweyi w geli, ke Newrozi piroze w yadi berzkırdınewey meşxelekeyeti.

Newroz cejneki xoşi w şadi ye bo zûrbey gelani Rohelati Nawerast, her çende bo geli Kurdistan nişaney serkewtın e be ser zordaran da, belam bote nişaney bergıri w berengarbûnewe dıji hemû core zulm û zor, zebrû zeng û çewsaneweyek, ke em roje piroze kori xebat ziyatır be tin ekaw hesti şorışgêrıyan berz ekatewe. Em ro dıjmınani wulatekeman be hemû hêz û tuwanayekiyanewe eyanewê simay geli Kurdıstan lebın û bêxewe bısırnewe, hiwa w amanci gelekeman helkêşın, belam ta ku êsta be hemû dırındayetıyeki xoyanewe neyantuwaniwe mebeste bogenekani xoyan becêh bıhênın, belkû bepêçanewe ziyatır hander buwe bo têkoşan û berzkırdınewey hesti qaremanıyeti gelekeman le zindan, çiya şahr, şahroçke w kêlgekan da. Newroz tırsêyeki ziyatır exate dıli dagirkerani Kurdıstanewe, her boyeşe benızik bûnewey em roje hêrışi benaw paksazi ekene ser nıştimanekeman.

Em ro kori xebat le hemû layeki Kurdıstan da perey sendu-


Şorışgêr Eskeri

we. Le Kurdıstani İran da paş sernûgûn bûni Heme Reza Şahi xwênmıj, be hezaran pêşmergey qaremani gelekeman meşxeli şoreşıyan berzkırdotewe w daway azadi xoyan eken, ke ta mırdın waz nehênın. Ba rejimi axundekani İraniş baş bızanın, nek be dıro w delesey bestnewey xebati gelekeman be imperyalizmewe, belkû be kuştın û bombabaraniş neyan tuwaniwe têkoşani gelekeman sıst bıken û xelki tıri pê tefre bıden û xoyan le imperyalizm dûrxenewe.

Le Kurdıstani Iraq da, paş Aşbetale Şûmekey Serokayetiy Xêlekiy Koneperest, carekitır şorışi gelekeman destikırdewe be Şeri Partizani, be şêweyeki NUWE kori xebat becoş kıra. Be hezaran pêşmergey nebez û dılêr roj be roj sûrtır ebın le ser bedihênani mafi çarenûs û amancekaniyan, ke rejême faşistekey Seddami Xıstate peleqajey seremerg, hêze niştimani w pêşkewtınxwazekani Kurdıstan û Iraq zor car hewli 'yekêti w leyeknızikbûnewe' yan dawe. Em ro xaki Kurdıstan bote malbendi şeri şorışgêri w helanewey xebatkeran. Seddami xwênrêj her wekû hemû dıjmınani tıri Kurdıstan berdewam e le kuştın û bırin û lesêdaredani hezaran roley qareman û becergi gelekeman, eme le layek, le layekitirişewe ragwêzani xelki kêlgekan û textkırdıni gundekanıyan û bırdınıyan bo ordugah zoremilêkan, çementokırdıni kaniwekan û sûtandıni dargwêzekanişewe newestawe belkû bo mawey sê sal eçêye şerêki nalebari berpa kırdıwe, legel rejême koneperesteyek Xumêni, ke sûtemenıyekey her reş û rût û çewsawekani herdû wulate, bem reftare Hitleriyaney ziyatır gıri berdawete cergi rolekani gel, ke hergiza w hergiz tuwanay berbest kırdıni nebê.

Bar û doxi Kurdıstani Turkiye, paş inqilabe eskerıye faşistekey İloni (September) 1980 kewte qonexêki tırewe. Ke generale be xwên tinuwekan kewtıne kuştın, be komel le sêdaredan û eşkence kırdıni zahmetkêşani gelekeman. Be bêşık çewsanewe bo geli Kurdıstan şıtêki nwê niye, belkû ewendey jêrdesti Kurdıstan kon e. Wurwujandıni faşistekan ziyadi kırd be hoşyarbûnewe w têkoşani geli Kurdıstan, be hezaran kes le zindan û gund û hemû goşeyeki xebat da bangewazi azadi bo Kurdıstanıyan ekırd. Dıji alqe legwêkani imperyalizm, hoşyari w têkoşani çini krêkarani Turkiyey berzkırdıbıwewe w

www.arsivakurdi.org

berew şorış eçû. Belam le ber pêknehatıni yekêtiyeki behêz lenêwan hêze pêşkewtınxwazekan da em hiwayey duwaxıst. Esta le Kurdıstan û Turkıya be sedan hezar kes le zindanekan da be nwêtırin cor eşkence edırên. Be sedan sosyalis û nıştimanperwer le jêr zebr û zeng û kuştın da enalênın. Wekû ew deng û bansaney ke belawbûnetewe, paş helatıni serleşkerekani Şahi sernûbûni İran rûyan kırdote Turkıya w Kurdıstan ke em ro be hemû zanıyariyeki eşkence danewe berbûnete rolekani wulatekeman. Ew nebez û dılêraney ke tali w swêri zindanekan eçêjın zorbaş ezanın duwaroji rûnak her hi gele w neman û şerşoriş her bo dıjmınan e. Bo serkewtın û bedesthênani mafi çarenûs ebê hemû hêze niştimani w pêşkewtınxwazekani Kurdıstan le ser bınçine şorışgêriyekan yekgırın dıj be dıjmınani geli niştimanekemn.

Le Kurdıstani Sûriye rolekani gelekeman bê beş e le bıçûktırin mafi netewayeti w mırovayeti, ke nek her natuwanın be zımani zıkmaki xoyan bıxwênın, tenanet zûrbeyan şûnasnameşiyan niye, be pilan û metodi dıjwar derekırên le wulatekeyan ke emane hemûy belaf û gezafi pêşkewtınxwaziyewe encam edırên.

Xuşk u Bırayani Berêz !

Qonaxi êstay gelekeman zor dıjwar e, lem kate nasıke da ahengi Newroz egêrin ke dıjmınan be hemû tuwanayekıyanewe çwardewri wulatekemanıyan dawe. Belam be pêçewaney arezûy dıjmın em ro şorışgêrani gelekeman wekû hemû gelani tıri jêrdestey em dınyaye, têkoşin û kori xebat be coştır ehênın seri azadi w serbıxweyi be tenha le wulati ême da niye belkû le hemû sûçêki em chane ye. Wek Rohelati Nawerast geli qaremani Felestin bo serbıxoyi wulatekeyan xebat eken. Emrika pıştgıriy hemû hênışêki Hitleri İsrail eke ke eykate ser xakı Felestin û Lubnan. Be nwêtırin cori çek, bomba tank û frokey serbazi desti kırdıwe be kuştıni reş û rût û şorışgêrekani Felestin û wêran kırdıni wulatekeyan. Be sedan hezar pir, mınal, jın û lawi kuştuwe w sergerdan kırdıwe. Fit û pilanekani imperyalizm le hemû layeki cihan da cêbecê ekırên dıj be rencderan û zahmetkêşan ke hewli damırkandınewey agırê şorışgêriyekeyan le layan alqele guwê w hawpeymanekanıyanewe, her wekû le Selvador, Gûatemala w Emrikay Latin.

Emrika eyewê jımarey çeki atomi le wulatani Ewrûpay Roava da ziyad bıka, her weha bayexêki zori dawe be Turkiya û Kurdıstan bo danani payegayeki gewretıri atomi dıj be sovyet.

Xuşk û Bırayani Eziz !

Newroz seretay behare w kotayi hatıni befr û tofan û sard û serma ye. Behari jiyanewey xak û gıjûgıya w dar û dewen e. Nişaney hoşyari w berpercdanewey zordesti ye. Her wek le layen netewe yekgırtuwekanişewe bistûyeki Adar bote rojek dıji nejadperısti ke eme xoy le xoy da mana w bayexêki gewretır eda be Newrozi piroz. Ke geli Kurdistaniş şan be şani gelani jêrdeste xebat bıken bo azadi w serfırazi w serbıxayi dıj be imperyalizm kolonyalizm û nejad peresti.

- Bıji Newroz !
— Bıji yekêtiy hêze niştimanperweran !
— Bımre imperyalizm, kolonyalizm û nejadperesti !



Koroya Federasyonê

# MESAJÊN PARTİ Û RÊXISTINAN

## MESAJÊN PARTİ Û RÊXISTINÊN KURD

### JIBO FEDRASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD

Bi silavên germ !

Bi navê partiya dımoqrat ya pêşveriwên kurd li Sûryê - leqê Ewrûpa, cejna nıroza we pıroz dikin û em hêvıdarin ko fedrasyona we gavên hêja berpêş bavêje. Û yekıtiya we bibe bingehek ji bo yekıtiya hemı tevgerên welatperwerı di kurdistanê de û em hêvıdarin ko em li kurdistaneke serbest û azad cejna nırozê bi hevre bikin û her û her em bi werene.

- Bijı cejna nırozê.
- Bijı fedrasyona komelên kurdistanê li Swêd.
- Bimrin şovınıst û kevneperest û dijminê gelê kurd û kurdistan.

PARTİYA DİMOQRATÊN KURDÊN PÊŞVERÛ LI SÛRİYE -LEQÊ EWRÛPA

### FEDERASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD

Sembola lıberxwedana netewi û ya serxwebûnê NEWROZ; isal ji dı bın rewşên dıjwar de tê piroz kırın. İro lı her çar alıyên Kurdistanê lı dıj zılm û zordarıyan, gelê me lıberxwedanek bê hempa dıdomine. Ev lıberxwedan bı agırên NEWROZÊ dê geştır bıbe.

Ev şerê lı dıj faşizm mêtıngehkari, emperyali û kevneperestıyê dıvê geştır bıbe. Eşkere ye ku ev ji bı yekitiya hêzên şoreşger û welatparêzên Kurdistanê pêk tê. Gırıngıya vê,dı şertên iro de pêwistıya xwe daniye ortê. Jı ber vê yekê NEWROZA ku iro em piroz dıkın, devê bıbe gavek jıbo yekitiyê.

Bı daxwaza me ya yekitıyê cejna we ya NEWROZÊ piroz dıkın dı xebata weya federasyonê de serfıraziya we dıxwazın.

Bıji NEWROZ !

-PPKK-
PARTİYA PÊŞENG A KARKERİ KURDİSTAN

### FEDERASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD

Hevalên hêja,

İsal ji gelê me lı İran û Iraqê, cejna xwe dı bın ênışên sazûmana kevneperest û zordest, lı Tırkiyê dı bın nirê hukma faşist da derbaz dıke. Lê gelê me bı xurti rabûye û bo azadiyê şer dıke. Roj ne dûr e ku em Newrozê dı Kurdıstana azad da piroz bıkın.

Hevalno ! Riya serketınê bı hışyari û yekıtiya gelê me pêk tê. İro daxwaza gelê me û daxwaza hemû kesên welatparêz û pêşverû yekıtiya hêzên welatparêz e. Ew yekıtiya komeleyên we jı hemû parçên Kurdıstanê misaleki baş nişan dıde. Dıvê em hemû bona yekıtiyê kar û xebata xwe zêtır bıkın.

Cejna ku hûn bı hevra piroz dıkın tırs dıke dılê dıjmın û gelê me şa dıke.

Cejna we piroz be !

Kemal Burkay
Seknterê Gıştì
PARTİYA SOSYALİST A KURDISTANA TIRKİYÊ

### BERÊZ BIRADERANİ FIDERASYONİ TÊKOŞER

Miwane Berêzekan !
Xuşk û Bırayani xoşewist !

Be nawi Komeley Rencderani Kurdıstan, Rêkxırawi derewey welatewe, germtırin pirozbayi cejni Newroz, cejni netewayetiyi geli Kurdıstan le çewsawekani Kurd û gelekeman û bırayani Fiderasyon û hemû Kurde derbederekani Swid ekeyn.

Cejni Newroz, cejni azadiyi çewsawekani Kurdıstan e. Cejni rızgari w serfırazi ye, le zılm û zor û çewsanewe. Cejni proleter-

yayi Kurd e, be serkırdayetiyi kırêkari aza w qaremani Kurd, Kawey Asinger. Be ser xwênmıj Duhhaki zordar da. Yadi cejni Newroz ke numûneyeki bıçûk e le xebati sext û xwênawi çine zehmetkêşekani Kurdıstan dıji zordari w çewsanewe. Swêneki taybetiyi pır bayexi le mêjûy xwênawiy netewey Kurdi dabeskıraw,xakdagirkıraw da. Geli Kurdi qahreman leweti heye, le xebat da ye bo wedestxıstıni mafi reway zewtkırawi xoy, Belam, ewey cêy daxe tawe ku êsta ew xebate sext û dıjwarey berhemêki ewtoy nebuwe. Diyar e emeş hoy zor e (pır e). We yekêyek le hoye gıringekani sırûşti çinayeti serkırdayetiy bızûtnewekan, nebûni partêki pêşrew xawentêoriyeki şorışgêr û nenasini dost û dujmın buwe le layek. Le layeki tırewe, dırındeyi dıjmınekan û zorıyan û nexşe w pilanekani imperyalizmi cihani buwe be serokayetiyi Emrika w koneperesti. Nawçe w xomali roli gewreyan hebûwe, lem meseleye de.

Komeleman le yadi cejni Newrozi em sal da ebinê ke xebati geli Kurdıstani be Qonaxêki zor dıjwar û sext û nasık da têperê w rejime dagirkerekani Kurdıstan û le hêrış û pelamardan û nexşey imperyalizmi Emriki le Nawçeke da bo gemarodan û le nawbırdıni hemû bızûtneweyeki şorışgêri ye le serû hemûyanewe, bızûtnewey şorışgêri geli Felestini qahreman û bızûtnewey rızgarixwazi geli Kurd dêt. Bo ye çine zehmetkêşekan û rêkxırawe Marxiye - Lêniniyekan û hêze pêşkewtınxwazekani Kurdıstan le berdem taqikırdneweyeki yekcar gewredan, we eger sırya w dûrbin nebin nek her mafi proleteryayi Kurdıstan û mafi netewayetiy geli Kurdıstani, be dest nahênin, belkû bızûtnewe keşiman le dest eçê. Bo ye pêş hemû rêkxırawe siyasiyekani Kurdıstan erki serşani rêkxırawe proleteryekani Kurdıstan e, cılewi bızûtneweyi niştimani bıgırne qstoy xweyan be hawkari û tebayi legel hemû hêzę şorışgêr û niştimanperwer û pêşkewtınxwazekani Kurdıstan û ew wulataney Kurdıstaniyan pêwa bestırawe w dagir kırawe.

Bo bırini qonaxi rızgari niştimani hênanedi hukmêki dimokrati geli w mafi çarenûs bo geli Kurdıstan.

We lem yade piroze de komeleman peyman bo proletaryay Kurdıstan û cihan û Netewey Kurd taze ekatewe, ke rastgobın legel bir û bawerekeman da û dırêje bıdên be xebatı dırêjxayani şorışgêri û çekdari - ta ku awatekanıman dêtedi.

Carekitiriş cejni Newroztan piroz be w spasi bırayani Fiderasyoni têkoşer ekeyn ke em ahengeyan rêkxıstıwe.

– Bıji yadi cejni Newroz !
– Serkewtû be xebati proleteryayi Kurdıstan û Cihan !
– Sernugun bêt rejima dagirkerekani Kurdıstan !
– Yekgırtû be xebati hêze şorışgêrekani Kurdıstan bo bedesthênani mafi çarenûs.

KOMELEY RENCDERANİ KURDISTAN RÊKXIRAWİ DEREWEY WELAT

---

Hawrêyani Berêz !

Pêş hemû şıt pirozbayi ew cejne le êwey berêz û hemû geli Kurd û pêşmerge qaremanekani Kurdıstan dıkeyn. Serkewtıni êwe gele zorlêkırawekeman awate xwazin. Geli kurd le hemû beşekani Kurdıstan da rêgay pır le hewraz û nışêw û fidakari le pênaw awatekani (...) û sereray hemû hels û kewtêk ew rêgaye ber nada û hata gehiştan bı amance rawakani dırêje be xebati deda.

Wek agadar ın êsta nızik be pênc sal e, ke komelani qaremani kurd le Kurdıstani İran le jêr raberayetiy Hızbi Dimokrati Kurdıstani İran xebatêki sext û xwênawi be rêyewe debın. Le helûmercêk da ke rejêmi koneperest û dıji - insani Xumeyni be hemû tuwanay xoye we degıj azadixwazan û hemû nişaneyeki insaniyet rohatuwe û xesarêki zori le hêze niştımani û pêşkewtuwekani seranseri wulat dawe. Diyar e le Kurdıstani İran hêze reşekani rejêmi Xumeyni be tenya nin û be taybeti êsta şan be şani wan CAŞEKANİ QIYADEY MUWEQQET, tufengçiyekani kurani Barzani be hemû tuwanay xoyanewe dıji komelani geli kurd le Kurdıstani Êran şer deken û her le mawey dû hewtûy rabırdû da le dewr û beri şari Nexede (39) nefer le xelki gundekani ew dewr û bereyan qetlûam kırdıwe w gundekanıyan wêran kırdıwe w xelki bêtanıyan we kêw û şax xıstıwe.

Hawrêyani têkoşer !

Kurdıstani qareman û pêşmerge beşerefekani û tewawi komelani xelk beraberayeti Hizbi Dimokrati Kurdıstani Êran bew peri fidakari w lexoburdûyiyewe difa le bûni xo w azadi geli kurd deken û bo wedihênani dimokrasi w mafi diyarikırdıni çarenûs ke le jêr duruşmi be heqi stratêjiki Hizbi Dimokrati Kurdistani Êran (Dimokrasi bo Êran û Xudmuxtari bo Kurdıstani Êran). Xoy dınwênê hewl dıdın û gıyani xoyan bexêt deken û heta geyıştın be amancekaniyan xebati xoyan dırêje pêdıdın.

Be hiway sekewtıni xebati geli kurd le hemû parçekani Kurdıstan !

Mırdın û neman bo imperyalizm, dıjmınan û xayinan be newey kurd !

LAYENGIRANİ HIZBİ DİMOKRATİ KURDİSTANİ ÊRAN – LE SWİD

---

BRAYANİ FEDERASYONİ KOMELE KURDİSTANI - YEKAN LI SWİD

Miwanê Berêzekan !
Xuşk û Bırayên xoşewist !

www.arsivakurd.org

Yekêtiy Niştimani Kurdıstan-Rêkxırawi Swid germtırin pirozbayi le geli Kurdi qareman e ka le Kurdıstan. Be boney cejni Newrozi pirozewe. Le heman katiş da zor xoman be bextiyar ezanin ke pirozbayi le Federasyon bıkeyn be boney em cejne netewayetiyemanewe. Zor spasiyan ekey sebaret be bangazewekeyan û rêkxıstıni em ahenge bo Kurde awarekani Swid û cemaweri azadixwazi Swidi.

Cejni Newroz ke cejni netewayetiy geli Kurd e, şwênêki taybeti heye le mêjûy geli Kurdıstan da, sebaret bewey ke cejni serkewtıni çini çewsawey Kurde be serokayetiy Kawey Asinger be ser zulm û zordari w Ejdehaki xwinmıj da. Le yadi Newrozi em sal da xebati netewey Kurd be pıleyeki yekcar sexti têkoşan da erıwat. Ewiş lew ruwewe ke me ro le dû parçey Kurdıstan da xebati çekdari wa bo mawey çendin sal e berdewam e. Le Kurdıstani Iraq û Kurdıstani Iran da. We lem roje da le hemû kat ziyatır geli Kurd le herdû perçekey da tûşi hêrışi dırındane buwe le layen rejêmi faşist Iraq û koneperisti İrane we. Ke be hemû nırxêk gerekiyane geli Kurd û bızalnewekey le naw bıbın. Eme cige le rûy ke imperyalizm û nokerekani le hemû Kurdıstan û nawçe da xeriki pilan û nexşe dananın bo lenawbırdıni bızûtnewey rızgarixwazi netewey Kurd le hemû Kurdıstan da. İnca lem bare Aloze da belay ême we ewey ke em pilane pûç bıkatewe, tenha yekêti rizekani geli Kurd xoyeti w tensiq û hawkari tewawi nêwan hêze Kurdıstannıyekan û dimokratixwazekani nawçeye w belawenani nakokiye naserekiyekane le nêwan hêz û rêkxırawe siyasiyekani Kurdıstan da.

Yekêtiy Nıştimani Kurdıstan le katêka pirozbayi em cejne le xoy w geli Kurd û hemû parti w rêkxırawe siyasiyekani Kurdıstan eka. Ke şerefi beşdariy xebatiyan heye le bizûtnewey rızgarixwazi Kurdıstan da. Peyman bo gêli Kurd û gelani azadixwazi nawçe w cihan taze ekatewe, ke xebati şorışgêraney xoy pere pê bıdat le pênawi rûxandıni rejêmi faşisti Iraq û hênanekayey rejêmêki ittilafi w le pênawi hênanedi mafi diyarikırdıni çarenûsi geli Kurd le Kurdıstan da.

İtır carêki tıriş spas bo bırayani Federasyon ke, em şeweyan rêkxıstıwe w xoyan mandû kırdıwe.

Her bıji yadi Newroz, cejni Netewayetiy Geli Kurdıstan !

Serkewtû bê xebati Geli Kurdıstan le pênawi hênanedi mafi diyarikırdıni duwaroj da !

Sernugûni bo rejême dagirker û serkutkerakani Kurdıstan !

YEKÊTEY NİŞTİMANİY KURDISTAN RÊKXIRAWI SWİD

## JI KOMİTA PİROZKIRINA NEWROZÊ RA

Hevalên Hêja,

Newrozeke nû hat. Nıha lı çiyayên me aşê berf dıhelı, kulilk bejn dıdın, pez dızê, berx dıkalın û zıvıstan berbı bıharê dev dıguherı. Lê sed heyf, mıxabın dı van rojên germ û xweşık da tarıyê, tırşiyê, taliyê mina ewreki reş gırti ser Kurdıstana me ya delal. Va Newroza ji dı bın zılma zordesta da tê pirozkırın. Disa lı çiyayên Kurdıstanê eşkere- dızi agırê vêkeve, alafa berbı ezmin bılınd be. İro lı çar nıqên welêt bo Kurdıstaneke aza û demoqratik xebateke jêhati dajo. Karkır,



*Folklora Zarokan, Tensta/Rinkeby*

www.arsivakurdi.org

gundi, xwendekar, ronakbir bı kurti pıraniya gelê me hışyar û hewase, êdın rojên nezaniyê paşta dımên û riyeke zelal û qewim vebûye. Va riya, riya cıvateke azad, serfıraz û serbılınde.

Hevalên delal,

İro ji lı ser erdê welatê me bı sed hezaran leşkerên kolonyalista erış dıdın ser gel û xwinê dıreşinın. Lı riyên Kurdıstanê tanq û topên dıjmına xuya dıbın. Her roj mirov tên kuştın û gırtın. Ketıne ser riya gelê me nahêlın tava rojê bıde ser axa me bı bereket. Kılamên me bı me nadın gotın, govend gırtın ji qedexe kırın. Lêbelê gelê me bêhêvi û bêbawer nine. Dengê top - tıvıngan jı çıyayên Kurdıstanê bılınd dıbın. Deh hezaran gırti dı zindanên kolonyalista da bı mêrani lı ber xwe dıdın Va yeka ji nişan dıde ku gelê me jı riya azadiyê venagere. Kes êdın nıkare gelê me bıxapine. Hezar salan beri vê şıvan û gavanên Kurdıstanê lı dora Kawa yê hesınker cıvyan û tac - textê Dehaq hılweşandın. Zılma Dehaq bı nav û denge, gelê me jı dest wi pır kışand İro ji yên nû lı welatê me hıkım dajon û gelê me disa bındeste. İcar ji karkır, gundi, xwendekar, ronakbir bı kurti jın û mêr, xort û keç, kal û pirê Kurdıstanê dıji kolonyalista û faşista bı mêrani şer dıkın. Bêşık Newroz bû nişana serhıldanê û azadiyê Loma lı cem gelê me ewqas bı qedr û qimete Newroz. Va Newroza ji dı bın zılm - zordestiyê da derbaz dıbe dıçe. Lêbelê Newroz tên, Newrozên rojên azadiyê, serfıraziyê. Em dıkarın bı pıştgırtın û yekıtiya xwe van rojana hin ji nêzik bıkın.

Federasyona Komelên Karkırê Kurdıstan lı Alamanya Federal KOMKAR, Newroza we hemuyan piroz dıkın, serfıraziya we dıxwazın.

Bıji Newroz !

— Bımre cuntaya kolonyalist û faşist !

Bıji Azadiya Kurdıstan !

KOMKAR

FEDERASYONA KOMELÊN KARKERÊN KURDİSTAN LI ELMANYA FEDERAL

---

Hewalani Berêz !

Be boney Newrozewe ke roji rızgarbûni çewsawekan e. Le jêr stem û istismar da ye, germtırin pirozbayitan lê dekeyn.

Le katêk da ke Kurdistani qahreman le jêr hêrışi derındaney hukûmete koneperestekan da ye, be tewawi hêzewe le xoy û mafi xoy bergıri dekat û lew rêgaye da hezaran şehidi pêşkeşi şorış kırdıwe. Ew roje hawrê legel rêzi xwêni tewawi şehidani şorış û dırêjedan berêgayan rêz degrin. Be hiwayin ke alay geli qaremani kurd bo rızgarbûn bê le jêr stem û istismar da.

Legel pirozbayi yadi Newroz, pirozbayi le hemû kırêkaran û zahmetkêşan dekeyn. Peyman taze ekeynewe ke le rêy rızgarbûn man le jêr stem û istismari sermayedari le giyan man.

— Bıji Newroz !

— Senugûn bê sermayedar û stemkar !

RÊKXIRAWİ SERANSERİ HEWADARANİ KOMELEY ŞORIŞGÊRİ ZAHMETKÊŞANİ KURDİSTANİ İRAN

---

JI KOMİTA NEWROZÊ RA


Hevalên hêja,

21' ê Adarê sersala cejna Newrozê ye.

Sersala nû pirozbe.

Hevalên hêja,

Dı sersala nûda Kurdistan, hin




www.arsivakurdi.org

dı nava dıjmınê xwinxwarda perçıqandiye. Kolonyalistên faşist û kevneperest, welatême yê delal xıstıne bın destê xwe. Û dı mabênaxweda parve kırıne.

Gelême yê welatparêz, jı bo serxwebûna Kurdistan, jı bo rızgariya mılletê Kurd, jı bo azadiya gelê Kurdistan û jı bo yekitiyê têkoşina xwe dıde. Lê dı vê têkoşinêda hêz belavın. Şoreşger û sosyalistên Kurdistan ne lı ser hevın. Îro ê gıring yekitiye ! Yekitiyek bı bıngehi, yekitiyek lı ser esasê siyasi, ideoloji û rêxıstıni...

Dı vi wari da - jı bo yekitiya sosyalist û şoreşger - jı me çı bê xwestın û çı bar bıkeve ser mılê me em amadene.

Hevalê hêja,

Jı bo pirozkırına sersala Newrozê xebata ku Federasyonê diyar kır, em gelek pê kêfxweş bûn Dı vi wari da em Federasyonê piroz dıkın. Xebatek hin xurtır jê hivi dıkın.

- Bıji Newroz !
- Bımre emperyali, kolonyali, faşi û feodali !
- Bıji têkoşina meya jı bo serxwebûn, demokrasi, sosyalizm û yekiti !

K.U.K.
Berpırsiyarê Swêd

## BO FIDERASYONİ KOMELE KURDISTANIYEKAN-SWİD

Sılaweki Xebatkarane!

EM ro ser le nuwê Newroz rûman têeka, Kawey Oareman rûman têeka.

Nişaney serkewtıni xwasti çine zehmetkêşekan be ser zordare stemkarekan lê man werbıgırın. Cuwantırin p rozbayi w mubarekbayi w hezar sılaw bo rolekani geli Kurd man û ke aheng egêrin lêre birehêninewa w be kurnûş bo şehidani le dılçespawi miletekeman ke be xwêni pak û xawênyan dari azadıyan aw da. Her wekû be berzi le ber çawmane bergıri pêşmerge qaremanekan û xoyan ragırtuwe wek şêr le ser lutkey şaxekeşekani Kurdistan. We her Newrozek û gelekeman hengawêki dûri bıri le yekxıstıni rizekani her çon ke pıtewkırdıni rizekan gıringtırin pêwistıyekani millete w ke berew rûyi dıjmınêki dırnde ye.

Serweri w serberzi bo şehide le dıl çespawekani mılletekeman!

Bıji xebati gelan le penawi azadi w aşti w pêşkewtın !

Mırdın bo dıjmınani gelan !

RÊKXIRAWİ PARTİ GELİ DİMOKRATİ KURDISTAN LE SWİD

## JIBO FEDRASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD

Bı silavên germ !

Ez cejna weya newroza ısal pıroz dikim û mixabin ko ez nikarim di şeva kurdistanêde rû bi rû pıroz bikim, ji ber ko ez nexweşim.

Hêvıdarim ko fedrasyona we gavên mezin bavêje û bi yekıtiya we bibe bingehek jibo yekıtiya hemı tevgerên welatparêz di kurdistanêde. Û her û her ez bi were me.

- Bijı cejna newrozê.
- Bijı fedrasyona komelên kurdistanê lı Swêd.
- Bijı hevgirtina we.
- Bimrı dijminê yekıtiya we.
- Bimrin şovınıst û kevneprest.

Heval û xêrxwazê we
CEGERXWIN




www.arsivakurdi.org

# MESAJÊN PARTİ Û RÊXISTINÊN DIN

HEVALNO !

Gelê Kurd jı mafê xwe yê çarenûsi hatıye bêpar hıştın. Em bı dıl û can pıştevanıya têkoşina gelê Kurd lı dıji hêzên bandêr (hakim) û jı bo damezrandına dewleteke serbıxwe. dıkın.

Em, lı Kurdıstana Iraqê, rêxıstına cephê ku bı sınıfa karker ya Iraqê û pêşengê wê Partıya Komunist û bı hêzên dın ve lı dıji diktatorıya Saddam hatıye damezrandın, têkoşina ku lı İranê lı dıji diktatorıya Xumêni têt kırın û xebata ku lı Kurdistana Tırkıyê jı bo Cepha Kurdistan ya netewiyi demokratik û lı tevayıya Tırkıyê jı bo Cepha Anti–Faşist têt kırın, bı dıl û can destek dıkın û disa jı dıl û can ve dıxwazın ku hevkarıya we ya bı şoreşgêr û komunistan ve her dom bıke.

Em pıştevanıya têkoşina gelê Kurd, ya lı dıji diktatorıyên paş verû û faşist dıkın û daxwazên xwe yên pıştgırıya enternasyonali pêşkêş dıkın.

Em, Newrozê, roja têkoşina netewi ya gelê Kurd, jı dıl û can ve piroz dıkın.

PARTİ KOMUNİSTİ TIRKIYE
(YEKİTİ)
(Türkiye Komünist Partisi(Birlik)

YEKİTIYA KEDÊ
Rêxıstına Swêd)
(Emeğin Birliği İsveç Örgütü)

HEWRÊYÊN BERÊZ !

Em dıxwazın bı munasebeta vê rojê sılavên xwe jı we re pêşkêş bıkın û pıştevanıya xwe ya hewrêyi bı têkoşina gelê Kurd ya meşrû re, jı bo gıhiştına armancên wê, ifade bıkın.

Şayıya iro delil e, ku têkoşina rızgarıya gelê Kurd dıji û pêş ve dıçe.

Em dıxwazın anıha dı bira we binın ku gelê Iraqê - Ereb, Kurd û gurûbên geli yên dın - dı deke gelek dıjwar de derbas dıbın, lê dıgel her tıştı hêza têkoşina lı hember rejima faşist ya Iraqê bêtır dıbe .

Lı Iraqê tade û işkence roj bı roj bêtır dıbe, lê bı vê yekê re, lıberxwedana lı Kurdıstana Iraqê ji bı hêztır dıbe û lı vêder orduya têkoşer ya gelê me, ku jı al–Anssar û Pêşmergan pêk têt, dıjmınê gelê me rejima xwini ya Iraqê her roj bı paş ve dıxine.

Bıji Newroz!

PARTİ KOMUNİSTİ IRAQ
(RÊKXIRAWİ SWÊD)

---

JI GELÊ KURD RE !

Klûba Cuwanên Sosyaldemokrat lı Tensta dı roja we ya pirozba, Newrozê, da sılavên sosyalisti pêşkêşi gelê Kurd dıke.

Em pıştevanıya têkoşina gelê Kurd dıkın û hêvidar ın, hûn dê sala pêş me newrozê lı Kurdistaneke aza piroz bıkın.

KLÛBA CUWANÊN SOSYAL-DEMOKRAT–TENSTA
SUSANN JENSEN
(Serek)

---

HEWRÊYÊN BERÊZ !

Em pıştgırıya têkoşina we ya adil lı hember faşizm û İmperyalizmê û jı azadi û wekheviyê lı Kurdistana we dıkın.

Lı Iraqê gelê me dı bın zılmê de ye, û jı alıyê rejima Iraqê ve têt pelçıqandın.

İro gelek xwendekarên Iraqi, cuwan, karker û Kurd gırti ne û qedera hınek jı van gırtıyan ne kıfş e.

Bıji têkoşina Kurd !
Bıji Newroz !

KOMELA XWENDEKARÊN IRAQİ LI SWÊD
(Gırêdayê Gusır)

---

JI FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ RE !

Em roja sersala gelê Kurd, Newroza we, piroz dıkın, dı xebatên we de serketın dıxwazın.
Bı Sılavên bıratıyê

YEKİTIYA PÊŞVERÛYÊN TIRKIYÊ LI SWÊD
(İsveç Turkiyeli İlericiler Birl.)

www.arsivakurd.org

# TÊKILİYA ZARAVAYAN III

Malmisanij

EV NIVİSARA HEVAL MALMİSANİJ, DERBAREY TEKILIYA DENGAN DI ZARAVAYÊN ZIMANÊ KURDİ DE, DI VÊ HEJMARÊ DE DIQEDE. RÛPELÊ ZARAVAYÊ DIMILİ (ZAZAKİ) DÊ JI NIHA PÊ VE JI HIN GOTAR Û NIVİSARÊN DIN DOM BIKE.

B–Bedelıyayişê tipanê dengdaran:

| | | | |
|---|---|---|---|
| 8)s | | :Wasey,waştın | wastene , waştış |
| | | engus | engışt-e |
| | | heşpışe | espıcı |
| 9) c | - z | : erzani | ercani |
| | | tanci | tanzi |
| 10) ç | - z | : –iç | –iz,zi |
| 11) g | - z | : xug | xoz |
| 12) j | - z | : erzani | erjaney |
| | | jereji | zerecı,zerenc-ı |
| | | mejg | mezg |
| 13) s | - z | : smê lê | zımê li, zımbê li |

II– Xwı mıyan dı tadıyayişê tipanê P,B,F,V,W,M:

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1) b | - w | : bule | welı |
| | | babe | bawo,babi |
| | | kewanû | kebani, kewani |
| | | mê w,mê b | mê b,meyb-ı |
| | | babo | wabo |
| 2) b | - v | : bındırey | vındertış |
| | | bis-t | vist |
| | | bazday | vazdayiş |
| | | binay | vinayiş |
| | | badam | vam-e |
| 3) f | - w | : keften,kewtey | kewtış |
| 4) m | - v | : mındırey, mendirey | vındertış |
| | | hengıyin | hengımin, hıngımin |
| 5) p | - v | : pinekê | venekı |
| 6) w | - v | : watay | vatış,watış, vatene |
| | | welin | verin |
| | | wısey | vıstış |
| | | werg | verg |
| | | wulk | velk-ı |
| | | winay | vinayiş, veynayiş |
| | | werday | verdayış (verra dayiş) |
| | | waroke | varıge |
| | | wa | va |
| | | wuli | vılı |

III– Xwı mıyan dı tadıyayişê tipanê: X,Q,K,G,H,Y,W:

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1) k | - g | : waroke | varıge,varıgı |
| 2) q | - g | : qumqum | gumgumıkı, qumqumıke |
| | | qıjı | gıjık |
| 3) w | - y | : sawi | say |
| | | rê w | rey,ray |
| | | wê rege,wê rey | yere,ê re-y |
| 4) x | - h | : xuway,xuain | huwayiş |
| | | xunay | huwnayiş |

IV– Bedelıyayişê tipa "H" ya Hewramani:

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1) h | - c | : hit | cıtı |
| | | hityar | cıtyê r,cıtê r |
| 2) h | - f | : fê nık | honık,hwenık |
| | | fera-h | hera |
| 3) h | - g | : hun | gûni |
| 4) h | - s | : wehar | wesar,wusar |
| | | sewz | hewz |
| 5) h | - ş | : şmardey | hûmarıtış, amordene |
| 6) h | - v | : hizi | vızê r |
| | | hesure | vıstewre, vıstowre |

www.arsivakurdi.org

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | hesırwe | vısturi, |
| | | | vıstıri-y |
| 7) h | -w | : hurıznay | werıznayiş, |
| | | | wurıznayiş |
| | | kewo,kawû | kıho,keho |
| | | nwey | nehey |
| | | herduwe | wurdi,hurdi |
| 8) h | -y | : yere | hire |

V - Bedelıyayişê tipanê binan:

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1) ç | -q | : aloçnay | alaqnayiş |
| | | haluçıyan | |
| 2) ç | -k | : kênaçi | keynekı,, |
| | | kınaçe | çênekı |
| 3) d | -z | : dırû | zuri,zure |
| 4) g | -v | : ere gısnay | veşnayiş |
| 5) g | -w | : dega | dewe,dewı |
| 6) gw | -w | : wuni,winı | gwinı,gûni |
| | | wezı | gwezı,gozı |
| 7) l(dz) | -d | : ale(adze) | ada |
| 8) l | -n | : bencan | balcan |
| 9) l | -r | . mıle | mere |
| | | nêle | nire |
| | | welin | verin |
| | | welê | verê |
| | | roçın,rojın | lojın,locın-ı |
| | | melûçık | mıriçıke, |
| | | | mıliçıkı |
| | | walı,walê | warı |
| | | sal-ı | serr-ı |
| | | gelay | gêrayiş, |
| | | | geyrayiş |
| | | ımsal | ımser,emser |
| 10) r | -z | : xêre | xêzı |
| 11) w | -q | : wule | qule,qulı-kı |
| 12) y | -c | : yew | cew |
| 13) y | -g | : meges,megez | meyes-ı |
| | | verye,werg | verg |

ÛMARITIŞ DI (HEWRAMANİ) Û ZAZAKİ :

| GORANİ | ZAZAKİ |
|---|---|
| 1)yû,yue,ye,yek. | 1)yo,yew,jû,jew,zû. |
| 2)du,due,dui. | 2)dı,dıdı,du. |
| 3)yere,yeri. | 3)hire,hirê,hirı,hirye. |
| 4)çwar,çuar. | 4)çeher,çehar,çıhar,çear,çar. |
| 5)penc. | 5)panc,panj,poj,paj,pac. |
| 6)şış. | 6)şeş. |
| 7)heft. | 7)hewt,heft,howt,hot. |
| 8)heşt. | 8)heşt,heyşt. |
| 9)no. | 9)new,now,no. |
| 10)de. | 10)des. |

PRONAV(ZAMİR) Ê KESİ (2) :

| | KES | HEWRAMANİ/GORANİ | ZAZAKİ |
|---|---|---|---|
| | (1) | mın,emın. | ez/mı,mın. |
| | (2) | tû,etû. | tı,te/tû,to. |
| neri: | (3) | ad(adz,al),aw,ane,a,aw-i,ane. | aw,ay,we,o,yû,yo/ey,yey,jey,cı,di,yê,ayi,awi, adi,adê,adey. |
| maykı: | | ade(adze,ale) | a,ya,aya/yay,ja,jay,ca,da,ada,aday. |
| | (4) | ême,ime,mı. | ma. |
| | (5) | şıme,şıma,şuma. | şıma,sıma. |
| | (6) | adê(adzê,alê),işan,awşan. | ê,yê,yi,ayi,ayê/inan,ino,aynan,ayno,yêni ini,yini.hini,jini,cini,dini, |

ÇEND LÊKERAN (FİİL) DI MESTER (İNFİNİTİF) :

GORANİ(HEWRAMANİ) . –ay, ey; –ın-en:

1-amay. 2-bırmey. 3-bazday. 4-bian,biyey. 5-diyay. 6-gıriyan. 7- keney. 8-mendın. 9-mısnay. 10-kewtey. 11 rıjnay. 12-soçınay. 13-şıyay. 14-wardın. 15-wariyın,16-watey,watın,17-werday,18-wuten,19-wısey, vıstın,20-wurıznay.

ZAZAKİ. –ış, –yiş; –ını,–ene:

1-hameyiş,ameyıne. 2-bermayiş. 3-vazdayiş. 4-bıyayiş,biyayıne. 5-dıyayiş,vinayıne. 6-gırênayiş. 7-kendış. 8-mendış,medıne. 9-musnayiş. 10-kewtış. 11-rıjnayiş. 12-sucırnayiş, 13-şıyayiş,şeyiş 14-wardış,werdene. 15-varayiş. 16-vatış,vatene. 17-verdayiş,veradayiş. 18-wıtış. 19-vıstış,eştış. 20-wurıznayiş,wereznayiş

Çend lêkerê pasifi:

www.arsivakurdi.org

Gorani(Hewramani):–ıyay; –ıyan:

1-bırıyay. 2-nusıyay,nuisyan. 3-wenıyay. 4-şıkıyan.

Zazaki: -ıyayiş; -yıne,–ıne:

1-bırıyayiş. 2- nusıyayiş. 3-wanıyayiş,wanıyayıne. 4-şıkıyayiş.

EMR (İMPERATIF)LÊKERAN: Çend misali:

| | GORANİ | ZAZAKİ |
|---|---|---|
| (2) | (tu)bere | (tı)bere |
| | wiyer | viyer,vêre,ravêre |
| | b'eşnawe | b'eşnawe |
| | vace,waçe | vaje,wacı,vaze |
| | kere | bıkere,bıkı |
| Neyini(negatif). | | |
| | (tu) mekerû ewe | a mekere, me a ke |
| | qsi mekere | qısê mekere, qesa mekı |
| | me bûrinû | me bırre, me bırrı |
| | me qijınû | me qijje |

(1) : Hadank, Karl – Mann, Oskar, Mundarten derGûran, Besonders das Kândûlâi, Auramanı und Badschalâni, Berlin, 1930.

(2) : Brindar, M. , Zazaki dır pronav, Tirêj, hejmar:4, rûpel:54–59, Stockholm,1981.

# HELBESTEK JI ROJEN BARNAS

## EM

Kî em çandin ku ;
Biçinin
Çi îro
çi sibê...

Em ;
Ne
Di berîka dayika kesî de nok,
Ne jî
Di tesbîha bavê kesî de movik in.
Heta rizgariyê
Em, kansera di dilê Romê
Û
Li serê rohilatanavîn
tomik in.

Dost,
Dijmîn
Divê pê bizanin
Erê ?

www.arsivakurdi.org



# TİYATROYA KURDİ



Rohat

Hêzên kolonyalist û kevneperest hertım xwestıne ku, perdeyên tıyatroya kurdi gırti bımine jı ber listıkên tiyatroyê tırs - xofa wan iro ji mezıne Wan heta nıha nehiştiye tiyatroke nûjen(modern) lı Kurdıstanê derkeve pêşiya gel - şêni. Lê, tıştekî xuyaye ku dı nav van zordestiyên gıran da disa ji perdeyên tiyatroya kurdan gırti nemane. Bı destê hunermend û listıkvanên kurd pır caran tiyatroyên hêja hatıne amadekırınê.

Lı Kurdıstanê zordestan çıma hertım perdeyên tiyatroya kurdi bı darê zorê va anine xarê ? Jı ber ku, dı tiyatroya kurdi da her tım naverokkeke politik heye û dıji bındestıyê protestok heye, hêzên kolonyalist hertım hovın, ŗureş û rûtenine. Dı tiyatroya kurdi da ev yeka tê diyarkırın. Jı aliyê dın da, gelê me zora wan dıbe, wan bın dıxe û riyên fıreh lı pêşiya gelê me vedıbın. Baweriya rojên azad dılşa û baweriya nirşkandınê dı tiyatroya kurdi da pır xurte. Mêrxasên tiyatroya kurdi, dı listekên xwe da, bı dıjmınan va şer dıkın destên xwe dırêj pêsir û qırıka wan dıkın û bernadın. Bı kurtebıri em dıkarın bêjın dı tiyatroya kurdi da hertım hêzên nıjadperest û kevneperest bındıkevın. Dı dema komara Mahabatê da, dı sala 1945' an da lı Kurdıstana Îranê tiyatroke bı navê "DAYKA NIŞTIMAN" gelê me bı rasti rakırıye ser piyan. Bı hezaran mırov, ev tiyatroya mêzekırıye û zordestiyên dıjmın bı çavên xwe va ditıye. Vê listıka pıçûk kela dılê gelê me bılınd kırıye, tekoşin germ û tuj kırıye. Çawa tê zanin, dı tıyatroyê da dayikek jı alıyê 3 rêbıran da tê revandın û gelek hovitiyan dıbine. Paşê, ev dayıka jı alıyê lawên xwe tê xelas kırın. Ew 3 rêbır; dıjmınan, lawên dayikê; gelê me û dayik bı xwe ji; bı temsili dı dılqê (rol) Kurdıstanê da ye. Vê listıkêlı Mahabatê bı mehan ajot..

Çawa Mehmet Emin Bozarslan dıde xuyakırın, weki tiyatroya kurdi cara pêşin, dı salên 1918 - 1919' an da, dı nav rûpelên kovara "JÎN' da çap bûye. Navê listi kê ji ' MEMÊ ALAN" e. Paşi vê efrandınê lı herçar beşên Kurdıstanê pır tiyatro hatın listın, amadekırın û bı nıvisarê hatın çap kırın. Dı nav vê rewşa dıjwar û dı nav mercên (qewl) kolonyalist da, ev rêhıldana bı rasti serfırazike, lê belê ne bese.

Gotına (peyvok, kelime) tiyat ro jı zımanê Yûnani tê û ketıyê nav gelek zımanan. Gundi, şıvan, gavan û kesên nexwendi kêm hındık tê dıghên weki tiyatro çıye, ev gotına jı kurdan ra tıştekî biyani nine. Dema mırov lı Kurdıstanê lı ser tiyatroyê deng dıke, gundiyên kurd rewşa dı navda ne belengaziya xwe ji dıdın ber çavê xwe û dıbêjın: 'Em bı xwe bûne tiyatro", paşê gazın lomanan dıkın. Jı aliyê dın hın kes hene, kurd bı çaveki dın va wan dınhêrın û jı bo wi kesi dıbêjın "Qe bûye tiyatro'. Hemû evana nişani me dıdın ku, kurd bı salan gotına (peyvok) tiyatroyê va dınasın.

Lı Kurdıstanê hın kes hene bı serê xwe (spuntane) tiyatrok pêk anine, gel jı vana pır hêz dıke. Ew kes gund - gund dıgerın û dıkevıne gelek dılqan (rol). Kurd jı van kesan ra dıbêjın "Dewrêş", "Mırtıv ', "Poşe" û "Kosegeli' ... Ew jı ber listıkên xwe jı gundiyan rûn, penır, pere an ji tıştên dın berev dıkın. Bı taybeti listıkên Kosegeli lı Kurdıstanê pır belav bûne. Gotına Kose bı xwe tê wê menê weki ew kes bê pırç, an ji keçele. Lı Kurdıstanê keseki dıkeve dılqê kose kıncên nediti xwe dıke, carına post - çermên heyanan xwe dıkın, xwe wek kal piran xûz dıkın û dılizın. Lı Kurdıstanê bı taybeti dema rojên Newrozê nêzik dıbın, Kosegeli ji derdıkevın listıkê. Disa dema baran - şıli nabare, hın kes gêzikê hıldıdın, gêziyê bı pırtık - pinên rengin va dıxemılının, dı nav gund da dıgerın. Kurd jı van kesan ra dıbêjın ' Bûka Baranê'' û ew kesana pır qeşmeriyên bı ken dılizên. Wek van listıkan pır listık ji dı dema cejna 'Beran Berdanê'' da tên listınê. Hemû ev listıkana hebûna tiyatrokê dı nav gel da nişani me dıde û şaxên (motif, varıyant) wan ji pır cure - cure û dewlemenın.

Îro, mırov dıkare bêje tiyatroya kurdi naverokeke politik destxıstiye. Têda tema û nexşên welatpareziyê (nıştımanperweriyê) pır xurte. Tiyatroya kurdi dı nav vê rewşa dıjwar û çetın da disa ji berbı tiyatroke nûjen (modern) rê hıldıde. Îro tu dınhêri bı hezaran kes lı Kurdıstanê û bı taybeti lı derwayi welat (lı Elmanya federal, İsveç, Yekıtiya Sovyet...) bı kêfxweşi tiyatroyan mêze dıkın Bı rasti iro tiyatro û gelê me dı nav hevda mane, jı hev dûr nının. Jı ber ku dı tiyatroya kurdi da êş bırin der - kulên gelê me tê vekolandın û riya azadi xelasiyê tê xuyan.

Heta nıha pır tiyatroyên kurdi hatıne nıvisandın û hatıne listın. Dı nav van listıkên tiyatroyê da, em dıbinın ku lı ser bûyer û cejna Newrozê, mitologiya wê, pır tışt hatıne amadekırın. Dı sala 1966 lı Kurdıstana Iraqê, jı aliyê Cemal Abdulkadir Baban de tiyatroke bı navê "NEWROZ" hat nıvisandın. Dı vê listıkê da keçıkeke bı navê Gulizer çawa dıkeve destê dıjmın û jı bo xelasbûnê, çawa berxwe dıde, têda serpêha tiya vê keçıka kurd heye. Disa Zeki Ahmet Xanar bı navê 'DAWÎYA ROJÊN DEHAKÊ ZORDAR' tiyatrok amadekır. Lı Kurdıstana Tırkiyê nıviskar Kemal Burkay ji lı ser Newrozê piyesek bı kurdi û tırki nıvisi. Lı pır bajarên Tırkiyê û Kurdıstanê

www.arsivakurd.org

ev tiyatroya bı jêhati hate listın.

Ne bı tenê lı ser tiyatroya kurdi, dı hemû waran da lı ser çanda (kultur) kurdi zordestike hışk jı aliyê kevneperestan da hatiye pêkanin. Lı ser kurdan çı xebatek çê bûye, gışt hatıne qedexekırın. Dı sala 1965' an da cara tiyatroya Musa Anter lı Kurdıstanê hate çap kırın, dest bı dest ew hate qedexekırın û weşan - listıka wê hat seknandın. Ev piyesa bı navê "BIRİNA REŞ" lı hêla Dıyarbekırê belegaziya gundiyan û rewşa wan dabû lı ber çavan.

Dı tiyatroya kurdi da, em dıbinın ku gelek pırsên cıvaki (sosyal) ji hatıne nıtırandın, dereca jıyina kurdan, Rewşa wan û kevneşopiyên gel, dı nav van listıkan da ciheki fıreh gırtıne. Lı Kurdıstana Iraqê nıviskar û ronakbirê navdar GORAN dı vi wari da 2 efrandınên hêja pêkani; 'BUKEKE NEKEM û GULA BI XWİN'. Dı van herdu piyesan da ji bı taybeti êş - janên pirekên (jın) Kurdıstanê hatıne vekolandın.

Dema listıkeke tiyatroyê derdıkeve lı pêşberi guhdarvan û mêzekaran, dı navbera beşdaran û mêrxasên tiyatroyê da kontaktên xurt, atmosfereke germin peyda dıbe. Jı ber ku kurd rewşa bı çavên xwe va dıbinın, janên wan, êş - problemên wan nıha ji dajon, ev yeka tesireke mezın lı ser wan dılize. Tiyatro hêrs - rıka kurdan dıji kolonyalistan tûj dıke û dı warê tekoşinê da wan dıghine hev. Pandomimeke pıçûk wek misaleki em dıkarın raberi we bıkın. Ev listıka bêdeng (pandomin) dı sala 1982' an da lı gelek bajarên Elmanya Federal, dı cejna Newrozê da hat listın.

Xumeyniyê hov pêşmergeyên kurd çawa dıdane ber gullan, pandomimê ev tabloyan nişan dıda. Ev pandomima bı navê "MIRIN ÇİYE" jı aliyê bı hezar kesan da hat ditın. Bı rasti dema vê pandomimi dılist, gelek kesan nıkarıbûn hêsrên çavên xwe bıgırtana. Ev yeka ji nişani me dıde ku tiyatroke baş dıkare mırovan rake ser piyan, wan bıherıkine. Jirbûn – jêhatiya listıkvanan, dengê wan, muzik, ronahi, reşayiya salonê, kıncên listıkvanan, hacet û hemû hûr - mûrên dın, dema baş hatın amadekırınê, tiyatroyên baş dıkarın derkevın maderê (holê). Dı vi wari da listıka Omer Polat 'MIHOYÊ ALADAXÊ", bı rasti hêjayi tiyatroke qenc bû. Tiyatroyê, hılbıjartına muzıkê (despêkê da dengê def - zurnê bılınd dıbe) mêrxas - listıkvanên tiyatroyê û bı pırsên berbıçav (konkret) va bal - guhdariya hezar kesan kışande ser xwe.

Beri şoreşa Oktobrê 1917, tu mafeki kurdên Ûrıstê tunebû. Lê paşi vê bûyera mezın, wek gelek netewên dın kurd ji gihiştın azadiya xwe. Dı warê hunermendi û çanda xwe da kurdên Sovyet serfırazi û pêşketınên mezın dest xıstın. Paşi çend salan, em dıbinın ku tiyatroya kurdi ji gavınê fıreh davêje Cara pêşin nıviskarê jêhati Erebê Şemo, dı sala 1931' an da lı ser tiyatrokê bı navê 'KOÇEKÊN DEREWİN" dıxebıte. Ev xebata destpêk bû. Paşê karên lı ser tiyatroyê hın ji pêşte çûn.

Dı sala 1934' an da Ahmedê Mırazi piyesek nıvisi, navê piyesa wi "ZEMANÊ ÇÛYİ" bû. Belengazi, xızani û nezaniya kurd, dı navda dıjin Ahmedê Mırazi dı piyesa xwe nıvisiye. Dı keriki piyesê da nıviskar, mêrxaseki tiyatroyê baş dıde dengkırıne: '... Ax lı mın, ax lı mın, mın jiyina xwe dı nav dıjwari û belengaziyê da pûç kır, ne têr nan xwar, ne ji dew, ne kınceke teze lı xwe kır, ne ji rıhalek dit, canım mın kur ji bı jari û belengazi mezın kır, bı mıra gıhiştın. Ê, em dıxebıtın - naxebıtın hemi çêlekê me yeke, nabe duda, bıznê me dudune, nabıne sısya, kırasê mın û laçıka Fatê ji teze nabın...". Çawa xweş diyare ku, nıviskar, dı vê beşê piyesê da, rêkê dıde ber me... riya azadiyê.

Lı Sovyetistanê tiyatroya kurdi, jı bo ortê hılanina bir û baweriyen kevnare - feodal berpırsıyarik hılda ser mılê xwe. Jı bo parastına maf û azadiyên mırovan bı vi tehri tiyatro bû haceteke perwerderiyê. Bı taybeti, tiyatroya kurdi rewşa, jınên kurd dı navdane, gıraniya xwe da ser vê pırsê. Ev tiyatroyên jêrin dı nav salên cıhê da lı Yekıtiya Sovyet hatın amadekırın.

- REVA JINÊ, Wezirê Nadırı
- ZEWACA BÊDIL, İsmayilê Diko
- SINCO QIZA XWE DIDE MÊR, Eskerê Boyik

Tiyatroya Elegezê, dı sala 1970' an da destpêkır, pır listıkên xweşık û delal amadekırın. Paşê pır tiyatro derxıste pêşiya mêzekarên xwe wek "BÊ QELEN", "TEYRÊ ELEGEZÊ" û 'KER Û KULİKÊ SILÊMANİ' jı aliyê lı Ermenistanê û Gurcistanê pır komên (grup) tiyatroyê hatın sazkırın. Van komên tiyatroyê, jı aliyê dın pır tiyatroyê gelên cinar wergerandıne zımanê kurdi û adaptiona wan bı rewşa xwe va hev anin, wek

- RİYA TEZE, H. Salçiyan
- XWEŞİ, M. Samxalov
- BER DERİ SEYÊ HAR HEYE K. Bucaidyz

Disa lı Ermenistanê çend tiyatroyên radyoyê ji hatıne amadekırın, car - carına mırov dıkare van tiyatroyan bı alikariya radyoyê guhdar bıke, wek ELOYÊ NEWÊREK, XECÊ Û SİYABEND, LÛR - DELÛR...

Bı kurtebıri karên lı ser tiyatroyê, dı warê xebatên politik, perwerdegariyê û dı warê ortê hılanina bir - baweriyên feodal da roleke mezın dılize. Çawa filozofiya diyaletik diyar dıke ku, heta mırov xwe neguhırine, an ji neguhıre, ew nıkare dı warê guhırandına cıvatekê da pêşkeve. Bı vê yekê va gırêdayi em dıkarın bêjın ku, dı warê guhırandına mırovan da cihê tiyatroyê pır fıreye.

www.arsivakurdi.org

# HELBEST

(...)
Minalakan !
Desgîranim
Kotirêkî Dîyarbekre
Hezî le çiya û qaspey kew û
Rengî befre
Bo gûwastnewey
Zincîrey çîyam qef qef birî
Rojjimêrim per per dirî
Pasaportim....
Awat û zerdexene bû
Kildan û kîsêk xene bû !
Ke le dergayî sinûrim da
Le batî maç
Maçî germî desgîranim
Tifî zerdî postalreşêk
Hat, suwaxî da nawçewanim

*A. PEŞÊW*

## EY REQIP

Ey reqip her ma we qewmı kurd ziman
Nayşkêne danêrî topî zeman
Qewmî kurd hestaye serpê wek dilêr
Ta be xwên nexşî bika tacî jîyan
Kes nelê kurd mirdûwa kur zinduwa
Zindûwa qet nanewê ala keman
Ê me roley Midîya û Key Xusrewîn
Dîn îman ayîn mane nîştîman
Ê me roley rengî sûr û şoreşin
Sexrî ke xwênawye rabûrdûman
Lawî kurd hestaye serpê wek dilêr
Be xwên nexşî be bika tacî jîyan
Lawî kurd hazir û amadeye
Canfîdaye canfîdaye, canfîda.

*DİLDAR*

## DEMÎ RAPERÎN E

Demî raperîne, demî raperîn
Heta key be sistî û be pestî bijîn
Pelamarê ey kurd araq riştinê
Le dil kirmî ankokî derkirdinê
Be yek bûne gişt
Pitewbûnî pişt
Be yek bûn ebê
Gelit serkewê
Demî raperîne, demî raperîn
Heta key be sistî û be pestî bijîn
Belada bike çakî merdayetî
Dirêxî meke giyan le kurdayetî
Bigirmêne wek şêr biçore neberd
Bilê kuwa heqî jînî însanî merd
Dirişt ta ku wird
Nekeyîn dest û bird
Be heq çûn egeyn
Pişû çon edeyn
Demî raperîne, demî raperîn
Heta key be sistî û be pestî bijîn

*GORAN*

## AŞTÎ

Xwa dezanî
Balay tivengim xoş navê
Balam, ax, kotirekey aştî
Kire, wekû
Şêrebefrîney beyanî
Le ser lûleyî
Metrelozî westa " Receb "
Denûkî xoy
Xistote jêr balekanî
Wek bîstûme
Ew kotire mangirtûwe
Le asmanî wilatêkî bê alada
Be şrîxey tiveng nebê
Qet le şeqey balî na de !

## SERKEWTİN

Serdekewîn
Çûnke diwênê,
Tope qurêkî deskirdim
Daye dest minalêkî kurd
Ew lebatî bûkeşûşe
Tivengêkî biçkolaney lê drûst kird.

*A. PEŞÊW*

# NAMÊN XWENDEVANAN

Berêz Hewalani Redaksiyoni Berbang !

Sılaweki germ... Hiwa man xoşi w serkewtın tane.

Hewalan ! Emanewê be nawi Komeley Geli Kurdıstanewe rayi hewalan man û hemû hewalani tıri parçekani Kurdıstani Êran û Iraq, ke hiç yekêkiyan oıge le wey nazanın be Kırmanci bıxwênınewe. We naş zanın ke piti Latini bıxwênınewe. Ca le ber ewe hiwadar in ke bıtuwanın carêkitır hewıl bıdın ke çend lapereyek wekû goşeyek be zarawi Sorani w be piti Erebi bınûsrê bo ewey ke ewaniş bê beş nebın lew govare Kurdıstaniye w ziyatır meseley Kurdıstaniyet be ce bıhênrê. We her weha ewaniş lejımara duwem zarawi Kurdi pêkehênın.

Carêki tıriş dawakar in ke em meseleye bıxene pêş çaw.

Xoşitan awat mane.
Bo pêşewe !

KOMITEY KARGÊRİ KOMELEY GELİ KURDISTAN

---

Jı kovara BERBANG'ê ra...

Çend hejmarên kovara "Berbang" (hejmar 1,2,3) gıhiştın destê mın û ez pır kêfxweş bûm. Ez zımanê kurdi kêm zanım, lê disa ji, mın hemû nıvisarên wê xwendın. Nezanebûna zımanê kurdi, jı bo mın kemasike. Ez bı xwe, dı sala 1938' an da jı welatê xwe hatıme durxıstın, ez dıkarım deng bıkım, lê ez nıkarım baş û rast bınıvisım. Jı ber ku, ez ji bı xwe, jı wan mırovanım ku, ew mırovên zımanê wan hatiye qedexe kırın. Ez bawer dıkım ku, bı alikariya Berbangê ezê zımanê xwe dı zûtırekê da hin bıbım.

Bı sılavên şoreşgeri
U. Özden

---

Hevalên Hêja,

Ez xebata we piroz dıkım, ez hêvidarım ku ev karên we, dı rêke demokratik û netewi da wê pêşta here.

Dıvê tu kesek vê xebatê pıçûk - hındık nebine, jı ber ku karên lı ser çand û zıman ji, dı tekoşina gelên bındest da ciheki gelek gıring û bı: rûmet dıstinın. Ne hukmeta Tırkan, ne ya Farısan û ne ji Ereban tu wext nehiştıne zımanê kurdi bı resmi bê nıvisandın, axaftın û bê çap kırın.

Çawa tê zanin bı hatına cûntaya faşist va zılm, teda û lêdanên lı ser gelê kurd hın ji zêtır bûn. Hemû rêxıstınên demokratik û karên hêzên şoreşger qedexe kır, bı hezaran mırov gırtın avêtın dı bın zindanan. Lêxıstın, pelçıqandın û xunrıjandınê xwe zêtır kırın. Lı Kurdistanê, cûntaya faşist manevrên leşkeri serhev pêkani, paşê ji gundên serhedê vala kırın. Jı aliye dın pır kes jı warê xwe dûr xıstın û kırın koçer, ewana bê mal û bê cih hıştın. Cûntaya faşist bı van tıştan va ji nema, rabû dı zagonan da guhartınên mezın pêk ani. Bı vi awayi cûntaya faşist tu mafeki mırovi û demokratik lı maderê nehişt. Pêşiya hemû karên politik iro lı Tırkiyê hatıne gırtınê.

Dı vê rewşa dıjwar da, dıvê lı derwayi welat hemû hêzên demokratik, mırovên pêşverû, şoreşger û hemû kesên dılsoz bı hevra lı dıji cûntaya faşist dengê xwe bılınd bıkın. Ez bı xwe dı vê baweriyê da me.

Ez pêşketınê û serfıraziyê jı we ra dıxwazım.

C. Cengo

---

Bıraderên BERBANG'ê,

Bı sılavên germin û şoreşgeri, ez jı wera pêşketıne dıxwazım û serfırazi bıra para we be. Ez pêvist nabinım pesnê Berbang'ê bıdım, le belê tenê dıxwazım bêjım, Berbang bı derengi dıkeve destê mın. Berbang bı rasti nişana hevkariyê ye û berhema wêye. Ez ne şaşım ku, ev cara yekemine, lı Ewrupayê kovareke xweser, bı zımanê kurdi, bı zareki xuri derdıkeve. Ez bêguman vê yekê ra pır şad dıbım.

Mın dıl kır ku ez çend helbestên nıviskarên bıyani wergerinım zımanê kurdi û jı we ra rê bıkım.

Dı dawiyê da, disa ez serketın û pêşveçûnê jı bo hemû hevalan dıxwazım.

Hevalê weyi dılsoz
Goran H.

---

## HELBEST

### DENG HAT BIRİN

Deng dernayê
Dernayê idi deng,
Ne jı şalûlan ne jı bılbılan.
Berê dıxwendın
Lı vi mıti, lı wi mıti
Lê, mıt pelaxtın
Hılweşandın, kırın wêran
Wêranek reş.

### ALOZ

Bêhn teng bûye,
Bêhn dernayê, disa tengıjim,
Lı hundırê serê mın,
dı mêjiyê mın de
Hemi raman û bir
Û hemi ditınıyan
Ketıye nava hev,
Lı hev hatıye badan
Bûye aloz.

*M. LEWENDİ*

### KEÇÊ KURDA

Keçê kurda hêvine
Gış feqir û bırçine
Gı lı ber desta sêwine
Ew gulên Kurdistanın

Keçê kurda hevalın
Mina kanya zelalın
Weka gulên bıharın
Ew gulên Kurdistanın

Keçê kurda bı sebrın
Gış bı dıl û xatırın
Wa bı dıl xweşi dengkırın
Ew gulên Kurdistanın


*BÊRİVAN*

www.arsivakurdi.org

# XAÇERÊZ

ÇEPERAST
1- Nıvisareki kurd jı Ermenistanê - Gava ku mırov pêlê derekê ke jı şûna wê re tê gotın.
2- Dı maneya ev e, lı vê ye, de. - Qabile, eşir. - Metod, şıkıl.
3- Wêran, xopan (berepaş).
4- Bı zaravayê dımıli "hat".
5- Cih, dews. - Lı hınek ciyan ar an ji arvan re tê gotın. - Ne tûj.
6- Rojek. - Bı zaravayê sorani "lı".
7- Dar an textê dora bêjıng an defê, lı hınek ciyan jêre çap ji dıbêjın. - Lı esman ın, bı taybeti ji bı şev xweş xuya dıkın.
8- Dı dirokê de dewletek, ku tê gotın bav û kalên Ermeniyane, û dewleta xwe ji lı ali Wanê ava kırıne.
9- Dezi, ben (berepaş). - Fêkiyek. - Pronavê kesemin ê yekejımara sısyan ya jıbo mêran.
10- Dı diroka islamiyetê de cara yekem wi azan xwendiye.

SEREJÊR
1- Lı dınê çıyayê bılıntır. - Bûyerek xuzayi (berepaş).
2- Gıranıya lı ser mıl, heml (berepaş). - Kesê bê av mayi.
3- Kunê jı bo şir.
4- Pêş. - Ne kevn, cedid (berepaş). - Weha, wılo.
5- Lı hınek ciyan jı darıstanan re tê gotın.
6- Erd, herri, turab (berepaş). - Jı dema ro dıçe ava re tê gotın (berepaş).
7- Ne nêr. - Xani, Emtiya.
8- Kesê dindar.
9- Fêkiyek.
10- Kêf, kêfxweşi. - Teriq.
11- Bı zaravayê dımıli jı avê re tê gotın. - Drûv, manzara.
12- Pêşnavê şairê mezın Nerûda.






| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | Û | Ş | P | A | ■ | E | B | A | B | İ | L |
| 2 | ■ | S | ■ | I | L | ■ | ■ | E | D | E | B | ■ |
| 3 | P | A | B | L | O | N | E | R | Û | D | A | ■ |
| 4 | İ | ■ | L | I | ■ | O | ■ | A | B | ■ | N | A |
| 5 | K | O | ■ | N | M | ■ | | D | ■ | B | ■ | K |
| 6 | A | R | A | G | O | N | ■ | A | R | İ | F | E |
| 7 | S | İ | R | ■ | T | A | ■ | Y | O | ■ | ■ | R |
| 8 | S | ■ | ■ | G | O | R | ■ | İ | Z | R | E | D |
| 9 | O | L | P | E | R | E | S | T | ■ | ■ | ■ | I |
| 10 | ■ | T | O | L | ■ | B | ■ | İ | Q | R | E | Ş |

NAVNİŞANA
**BERBANGÊ**
YA NU

BERBANG
Tunnelgatan. 14, 3 tr.
111 37 Stockholm
SWEDEN

TEL:: 08/ 11 23 42
POSTGIRO: 64 38 80 – 8




www.arsivakurdi.org

*BERBANG*
*TUNNELGATAN. 14, 3 tr.*
*111 37 STOCKHOLM*

MASSKORSBAND

BILAWKRAWEY

# İNSTİTUY KURDİ LE FRANSA

## JI WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ RE

DARA KU JI QIRNÊN XWE HATIYE BIRÎN HIŞK DIBE, DIMIRE. QIRNÊN XELKEKÎ ZIMANÊ WÎ, SITRAN Û ÇÎROK, EDEBIYAT Û DÎROKA WÎ NE, MÛSÎKÎ Û PÎŞE, AWAYÊN JIYAN, LIXWEKIRIN Û HIZKIRINA WÎ NE, BI KURTÎ ÇAND Û KULTURA WÎ YE.

GELÊ JI ÇANDA XWE BÊPAR HIŞTÎ MEHKÛMÊ WINDABÛNÊ, MEHKÛMÊ MIRINÊ YE. DEWLETÊN KU KURDISTANÊ LI HEV PARÎKIRINE VÊ RASTIYÊ QENC DIZANIN Û LOMA EV ŞÊST SAL IN, BI HEMÎ HÊZ Û QEWETA XWE HEWL DIDIN ZIMANÊ ME BIDIN WINDAKIRIN, DÎROKA ME YA KEVN Û DEWLEMEND BI ME BIDIN JIBÎRKIRIN, ÇAND Û HEBÛNA MILETÊ KURD, RÊÇ Û ŞOPA ME JI RIYÊ DINÊ HILÎNIN.

LI HEMBERÎ VÊ MIRINA GIŞTÎ, VÊ QIRKIRINA BÊDENG, VÊ ÎMHAYA DEWLEMENDÎYÊN HEZARSALÎ YÊN GELÊ KURD, BERXWEDAN PÊWÎST (LAZIM) E, ACÎL E, BI HEMÛ HÊZ Û QEWETA XWE BERXWEDAN. BERXWEDANA KESÎ Û GIŞTÎ.

<u>BERXWEDANA KESANÎ :</u> DIVÊ KÛ HER KURD HÎNBÛN, PEYIVÎN NIVÎSÎN Û BIKARANÎNA ZIMANÊ KURDÎ JI XWE RE ERKEKÎ (WEZÎFEKÎ) WELATPARÊZÎ ZANIBE, DIVÊ KU HER KURD NAVÊN KURDÎ LI ZAROKÊN XWE DEYNE, WAN HÎNÎ ZIMAN, KULAM, SITRAN Û ÇÎROKÊN KURDÎ BIKE, DIVÊ KU HER KURD TIMÎ BI BÎR BÎNE KU XWENDIN, BELAVKIRIN Û PIŞTÎVANIYA KITÊB, ROJNAME Û KOVARÊN KURDÎ PERÇEYEK SEREKEYÊ ŞERÊ WELATPARÊZÎ YE. EVÎNA ZIMAN ,AWAYEKÎ EVÎNA WELÊT, EVÎNA GELÊ KURD E.

<u>BERXWEDANA GIŞTÎ</u> : DIVÊ KU HER KOM, KOMELE Û PARTÎYA KURDÎ HÎNKIRIN Û PÊŞVEBIRINA ZIMAN, DÎROK Û ÇANDA KURDÎ TEK JI ŞAXÊN BINGEHIYÊN XEBATA XWE ZANIBE, PARASTINA ÇANDA KURDÎ JI XWE RE TÊXE ARMANCEKÎ SEREKE.

BI VÊ BAWERIYA KU PARASTIN Û PEŞVEBIRINA ÇANDA KURDÎ WEZÎFEKÎ ACÎL Û MEZIN E, NIVÎSKAR, DÎROKZAN, PÎŞEKAR Û BÎREWERÊN (ENTELLEKTUELÊN) KURDÊN LIJÊR BINAVKIRÎ LI DORA ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ DICIVIN, EWÊ BI HEVRA Û BI TEVKARIYA HEMÛ WELATPARÊZÊN KURDÊN HER ÇAR PERÇEYÊN KURDISTANÊ JIBO PÊKANÎNA ARMANCÊN HAN BIXEBITIN:

- DANÎNA MESTIRÎN KITÊBXANE Û WÊNEXANE YA CIHANÊ LI SER GELÊ KURD
- BERHEVKIRINA ARŞÎVÊN NETEWEYÎ (MILÎ) YÊN KURDISTANÊ
- NASÎN Û NEZÎKKIRINA ZARAVÊN KURDÎ (KURMANCÎ, SORANÎ, ZAZAK Î)
- ÇAPKIRINA KITÊBÊN XWENDIN, EDEBIYAT, ERDNASÎ Û DÎROKA KURDISTANÊ JIBO ZARÛKÊN KURD.
- BERHEVKIRIN Û WEŞANDİNA (KASET, SELIK) MUSÎKÎ YA KURDÎ
- ÇAPKIRINA BERHEVOKÊN ÇÎROK, METELOK Û STRANÊN KURDÎ
- ÇAPKIRINA FERHEGÊN KURDÎ Û KURDÎ–ZIMANÊN BIYANÎ
- ÇAPKIRINA AFIRANDINÊN HELBESTVAN Û NIVÎSKARÊN KURDÊN HEMDEM Û YÊN BERÊ
- ÇAPKIRINA WERGERANDINÊN KILASÎKÊN EDEBÎYATA CÎHANÊ
- WERGERANDIN Û ÇAPKIRINA PIRTÛKÊN KU BI ZIMANÊN EWRÛPAYÊ LI SER KURDAN DERKETINE
- DANNASÎNA PÎŞEKAR,HINERMEND, DENGBÊJ Û SAZBENDÊN KURD

ENSTÎTUYA KURDÎ DI XIZMETA HER KURDÊ WELATPARÊZ DE YE Û JIYAN Û PÊŞVEÇÛNA WÊ TENÊ BI ALÎKARIYA HEMÛ WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ MIMKIN E.

WELATPARÊZÊN KURD! LI RIYÊ DINYAYÊ YEK JI MILETÊN KEVNÊN KU ÎRO HÊ BÊ SAZENDE (MUESSESE) YÊ ÇANDÎ NE EM IN. PIŞTÎ XEBAT Û CEFAYÊN MEZIN ÎRO EM JÎ DIBIN XWEDÎIYE ENSTÎTUVEKÎ. LÊ XWEDÎDERKEVIN!

ENDAMÊN ŞEREFÊ
<u>YÊN ENSTÎTUYA KURDÎ:</u>
CEGERXWÎN, ORDÎXANÊ CELIL, YILMAZ GUNEY, HEJAR, KENDAL, QENETÊ KURDO,REMZÎ, OSMAN SEBRÎ, ISMET ŞERÎF VANLI, TEWFIQ WEHBÎ, NÛREDÎN ZAZA

AGAHDARÎ
GELÎ HEVALÊN KARKERÊN KURDÊN FRANSAYÊ,
ENSTÎTUYA KURDÎ DIKARE ALÎKARIYA HELKIRINA PIRSÊN WE YÊN SOSYAL Û HIQÛQÎ BIKE.
JIMARA ME YA TELEFONÊ: 824 64 64 (HEROJ SAET 10–18)